# Ezdîtî
# bawariya heqyê, rehmê û Xwedênasiyê ye

**Eskerê Boyik**

Wednesday, 25 May 2005

Çawa her ol û bawaryên dinyayê usan jî ÊZDÎTÎ dînekî qedîme, bingeha wê ji dewrana tê, gelek qonaxa, li rîya hebûn_ nebûnê ra derbaz bûye û gîhûştye roja îro. Ev dîna jî xweyê ulm, e,deb, qewl û qanun, rê û rism, erfşe det, eydşe_ refat, cîyên xweye pîroz, ocax û zîyaret, oldar, xas û babçek û xisûsyên xwe ye. Her tiştê ûlmê wê bi zarkî gihîştine me. Dînekî kurdewarî ye, ji bo nih ev bawerî tek di nav kurda da li kurdistanê maye û her tiştê wan bi kurmancîye.

Eger bi heqî kevnarya vê olê bê naskirin û ulmê vê olê û olên ji pey ra hatî(yên bi kitêb û pêxember) bi zanyarî bi-

dine rex hev, dijwer nîne bê texmînkirin ku gelek bîr û baweryên êzdîtyê ji bo ulmên wan olan bûne stûnên avakirinê. Ulmê vî dînî ulmekî pir dewlemend, kûr û pir qet û sereceme. Ku ber lêya hezarsalaye tunekirinê, li nav neheqya û nerastyan, şer şiltanxên bê hîm, xûnê, fermanên dagerkiran teyax kirye, maye û berdewane, ûsane, rastî jî bi tomerya xwe da ew heykelekî mirovayê yê dîrokîyî qedîm û bi qîmete.

Naveroka felsefa dînê Êzdîyan xwedênasyê, heqyê, îman û axretê, efirandina dinê, mirinê, jîyanê, qencîyê, xiravyê, rastyê, nerastyê, qewat û bûyarên xezayê, derheqa sirra Melek û Milyaketada ne.

Li bal Êzdîyan hebandina here mezin û bilind Xweda ye. Şaheda dînê Êzdîyan da ew fikir pir zelal sîhar dibe. Ew hema wa jî dest pê dibe: Şaheda dînê min yek Xweda ye. Xasên din: yek evîna Xwedê ye, yek ji nûra wîye, yek çiraye, yek îmane.. lê Xwedê yeke. Ji bo wê yekê jî Êzidî dueaşdirozgên xwe, qewlên xwe payê pirê bi peyvên ya Pebî (ya Xweda) dest pê dikin, carekê va banga xwe didine Xwedê: Yekê Jorîn, Rebê Alemê, ji bo çawa Êzdî dibêjin: Her ewî heqe, her ewî raste..

Ulmê vê olê da tê gotin: Xwedê hezar û yek nave bê heval û bê şirîke, erdek nîne hukumê Xweda lê nîbe. bêy hukumê Xwedê pel jî li ser darê naheje.

Bi bawarya Êzdîyan dîn: ol û erkan rê ye berbî Xwedê,

berbi heqyê û rastyê. Di wê rê da ezdîtî tu neheqyê, nerastyê, zinê, zordaryê, ji alyê evdekî da sêrandin, biçîkkirin, bêrûmetkirina evdekî din, civak, milet û dînekî din qebûl nake. Her kes evdê Xwedê ye û emelê wî ji alyê Xwdê va tê dîtin. Hebandina Xwedê vê bawaryê da digîhîje asta here bilind. Derew, bêbextî, şer gilîkirin, buxdan, kifir, nifir dizî, ralankirin êzdîyatyê da nayê qebûlkirin.

Êzdî dibêjin: Derew dijminê Xwedê ye Nifir şûrê du deve..., Kifrî kirin guneye. Di êzdîtyê da guneye, ku keda heram evdê êzdî tevî keda xweye helal bikin. Dema evdê Êzdî xêrê dike, ese dibêje: Eva keda mine helale...

Xêr kirin, xêr dayîn, alîkarî feqîr ûî belengaza kirin (bê cudetya din, miletvê, reng û tisên din) ferzne vê olêye pîrozin. Xêr gotî bi dil bê kirin. Eger xêr bê dil yan bi destê zorê, yanê jî ji tirs bê kirin xêra usan qebûl nabe. Mezinayî, biçûktî, yan pirqîmetbûn û kêm qîmetbûna xêre hesav nîne. Ya here mihûm ewe, ku xêr bi dil bê dayîn. Dibêjin nanekî ce yê xêra kesîb ya bi dil li cem Xwedê ji gakî xêra zengîn ya bê dil baştir hatye qebûlbûn.

Her qewl, beyt, lavêj û nimûnên ulmê vê bawaryê Xwedênasya here heq û jorîn dibe bingeh û li ser wê bingehê jî bîrşbawaryê vê olê tên avakirin. Xwedênazî di vê bawaryê da xwezayî ye, suruştî ye, her tişt, fikir xwezayê va tên girêdan, matêrîyalîne. Anegorî vî ulmî ruh li ser pêşdaçûyîna mecalên xezayî yênmatêryalî pêşda hatye... Qewla da wa tê

gotin:

**Xwedevandê me rehmanîÇar qism li rûyê dinê danî.**
**yek ave, yek nûre, yek axe, yek jîagire...**(1)

Yan

**Padşayê minî cebare,**
**Ji durrê efrandibûn çare,**
**Axe, û Ave, û Baye, û Agire.** (2)

Yan

**Ku kinyat pê zeyînî Axê û Avê û Bayê û Agirî**
**Qalibê Adem jê nijinî.**
**Çar qismet tek hincinî**,(3)

Anegorî ulmê vê olê pêşdahatina jîyanê li cihanê avê, axê, agir û bê va girêdaye. Zanestya îro jî usa dibêje. Qewlê şêx û Aqûb da tê gotin:

**Şêx dibêje te Aqûbî**
**Wextê qalibê Adem pêxember çê kir**
**Ew kî bû tasa qudretê lê kir?**
**Aqûb dibêje te yaş şêxê mino**
**Wextê qalibê Adem pêxember dibûye**
**Ferwara melkê adîya pê de diçûye...**(4)

Usane qalib pêşyê hatye çêkirin, paşê ruh bi tasa qudretê berva hatye berdan. Vira tê bêjî fikira Xwedê wek sîmvola xezayê, suruştê, tevê (royê) tê naskirin. Gelek lêkolînvan

besa peyva dirrê dikin, ev peyv û fikir li nav gelek nimûnên ayîna dînî ra derbas dibe. Besa teqîna dirrê tê kirin.

Niha ulmê cihanê yê pêşdaçûyî jî dibêje cihan û jîyana ser ji teqîneke ers pêşda hatine.

Qewla Efrandina Kinyatê (dinê)da wa tê gotin: ku erd û ezman tunebûn, dinya fire bê bîn bu, însan û heywan jî tubebûn, di berê (deryayê) da tenê hebî dirr. Paşê tê femkirin ku padşê min (Xwedê) ji dirrê bû. Ev fikira pêşbûna matêryayê ji ruh ya zanestî ku zanyarê cihanê tek sed salên 19_ 20 an da gihîştinê, lê ayîna dînê ezdayê da bi hezarsalan berê hebûya.

Usane anegorî mêtolojya dînê Êzdîyan Xwedê ji nûra xweheft Milyaketa dixuliqine, ji pey ra jî Ax û, Av û, Ba û, Agir laşê Adem diefrîne, bi destûra Xwedê Milyaket jî ruh ber laşda berşdidin...

Fikira yekîtya matêryayî ya erş û dinyayê jî ulmê êzdîtyê da heye. Qewlê Erd û Ezman da ew fikir zelal tê gotin:

**Erd dibêje: Ezmano, eslê min û te ji derekî**

**Em nijarkirin ji cewaherekî**

**Şefeqê li me dikete derekîk..** (5)

Ev sebeqa carke din jî dide îzbatkirin ku êzdîtî dînekî suruştîye, bingeha wê da ne hêz û sirrên neeyane, nedîhare fantastîk in lê qewat û bûyarên suru ştîne...

Erd, ezman, roj, ax, agir, steyrk, hîv, av, ba, nan,li cem

Êzdiyan pîrozin. hela xweykirina pêz, dêwêr, xetkirina axê, barîna baranê, helalkirina mest hêz û qewatên xezayîye pîroz va tên girşêdan. Pîrozya van sûbyêktên suruştê, ku heta niha jî di êzdîtyê da mane pir kevnin.

Eudên Êzdîyan jî xezayê, zayînê, ronayê, jîyanê şayê va girêdayîne. Di rojên eydan, bi rastî evdê Êzdî xêr û xweşyên suruştl raşa dibin, xêra dikin, xwe ji gunehan peqij dikin, pesnê edlayê, tifaqê, xêrxwezyê, pismamtyê, hevkaryê didin. Fikirên xirav ji dilê xwe derdixin, dilşsyrye nav xwe didin hildan. Eydeke here kevnar û qedîm Çarşema serê Nisanê: Çarşema Sore.

Qewlê Çarşema Sor da watê gotin:

**Çarşema serê Nîsanê**
**Gul û çîçek hatin meydanê**
**Tawisî Melek reyîsê îmanê**
**Nîsan deng lê kire**
**Bihar pê dixemile**
**Bi kesk, sor, sipî û zere...** (6)

Di bawarya Êzdîya da wê rojê Tawisî Melek peyayî li ser rûyê erdê bûye, xwe ra bihara rengîn, xêr û xweşî anye, kulîlk vebûe erd bi rengên kesk, sor, sipîû zer zemilye. Bi hezaran sala ev dên ezdayî vê eyda xwe ku eyda Tawisî Meleke bi coş û bawarîke xurt pîroz dikin. Xwe hesav dikin miletê Tawisî Melek.. DI vê bawarya kevnar da Tawisî Me-

lek melekê îmanê , xêrê û xweşyêye. Xwe ra biharê, gul û kulîlka tînê, bi renga dinyayê, jîtanê dixemile. Evdên Êzdîyan yên dinê jî xezayê, jîyanê va girêdayîne. Eydek nîne ku şabûn, ronahî, tifaq, paqijayî, xêr. heş lalî û heqî neyê psonandin, bi kêfxweşî şabûn, stran û dîlan derbas ne be.

Bingeha felsefa xezayêye here hîmlî pirsa jîyan û mirinê ye. Felsefa dînê exdayê da jî ew pirs gelekî kûr, fire û her alya va hatye analîzkirin, cawa pirsgiêkan hatye dayîn: tê zanîn ku cihanê da çawa pêwîstya bûyînê, xuliqandinê heye, usa jî ya mirinê. Çi destpêka wê hebe gerekê dewî jî hebe. Çi çe dibe gotî bimire jî. Herd du serê meselekêne. Li vê bawaryê da çawa jiyane pîroz usa jî mirin. Qewlên Seremergê, Miskîno jaro û hineke din da gelekî kûr û dûr felsefa jîyanê û mirinê tê dayîn. Jîyana evd, beşer heta hetê nîne, dinya milkê tu kesî nîne. Dinya tu kesî ra neşmaye û wê nemîne jî. Rojekê bê û beşerê ese ji kasa mirinê temke. Mirin tenê seva ruhbera, dar û hêşnaya tenê, dewya her tiştî heye. Heqî eve, rastya jîyanê eve.

Evdê Çzdî bi vê felsefê tê perwerdekirin ku ji wê dûyara giran ra hazirbe. Xweyî, xwedan, xizm û pismamên mirî jî we qewimandina giran ra qayîl dibin, ew wan ra jî dibe dibînî, ku evd rojekê bûye wê rojekê jî bimire. Kes nikare mirya paşda bîne. Emrê Xwedêye, gerekê bi zanyarî nêzîkî wê bûyarê bibin...

Li gor ezdîtyê mirin dewya jîyanê nîne, mirin berdewama jîyanê ye. Ulmê êzdîtyê da Kirasguherîn heye. Laşji axê çê bûye, dîsa diçe dibe ax, lê ruh namire ew anegorî emelê evdê mirî qalibê ruhberekî din da jîyanê berdewam dike..

Êzdîtî li ser bawarmendên xwe rastyê şermê, tifaqê, ruhê biçûk, amintyê, xêrxwezyê ferz dike.

Dibêjin: Êzdî miletê şermê ne.

Di bawarya Êzdiyan da li cem Xwedê her kes, bê cudatya ol, rê û rizm Evdê Xwedêne. Kes ji kesî zêdetir yankêmtir nîne, kîna kesî li cem Xwedê nîne, Xwedê li hemû derda dermana, xwedê derîkî digre, hezarî vedike. Tu kes bêxwedê ji dayka xwe nabe û bê Xwedê nîne. Qencî û neqencî nava kar û emelên ecda da tên xanê. Dibjin: Qirar qirara Xwedê ye, kes nikare ji qirara Xwedê bireve. Qencî jî, xiravî jî ji dergê Xwedê ten. Her kes qencyê jî, xiravyê jî ji xwe ra dike.

Her kes roja mirinê li ber MÎRÊ xwe cawa kirinê xwe dide... Her kes weke emelê xwe cezayê xwe dikşîn... Êzdîtyê das ku ştin qetilkirin, talankirina tu kesî, tu netewî ji alyê netewek din da bi tu cûreyî neyê heqkirin, ew guneyê mezine û bi tu menyê nayê efûkirin. Li cem Êzdiyan tu ol ji ya din heqtir yan neheqtir nîne. Ulmê vê olê da derheqa tu bawaryê da xirav nayê gotin, himberî xwe tu olî biçûk yan mezin navîne. Êzdî bi destê zorê tu kesî mecbûr nakin bên ser ola wan.

Vê bawaryê da pirsên tifaq, yekîtî û tevayê çawa serê safîkrina hemû pirsgirêka tên dîtin. Tifaq ne ku tenê nava Êzdîya da li usan jî tifaq di malê da, civakê da, li nava hukumdar, milet û dewletê da, heta cihanê da hînê xweşyê, başyê, heqyê û Xwedênasyê ne:

**Çûma dîwana wî padşayî.**
**Min lê dîtin xweşî û şayî.**
**serê hemyan tifaq ûî tevayî...**

Di êzdîtyê da di navbera evd û Xwedê da evdek, rêberek yan ruhberekî din neyê webûlkirin.

Çiqas jî xas û qelenderên Êzdiyan hene, lê dîsa anegorî edeba vê bawaryê, ew dewyê da, roja qiyametê li ber Mîrê xwe cawa emelê xwe didin.

Bawarîya wa çiqasî jî di vî dînî da bi hurmet û wedîme, dîsa Êzdî qedir didine pêxemberan, xasan û qewil, beyt, due aşdirozgên xwe da bi hurmet û qedir navê wana bîr tînin: (Adem, Nuh, Birahîm Xelîl, Zerdeşt, Mûsa, Îsa, Mehemed). Bi texmîna me ev fikira jî tînê wê rastyê, ku êzdîtî ji wan yekan dînê kevnare, ku ji berî pêşdahtina pêxembera hebûye û bawarî ji yekîtya Xwedê, Êzdanye. Ulem da wa tê gotin: Ferwar hatiye ji ba melekê celîl, hemû dema û hemû bedîl, berî Mûsa û Îsa û Brahîm Xelîl.

Bi texmîna min wezîfa pêxemberan ku olên din da berşer dikin, ezdayê da wê rolê Tawisî Melek dilîze. Eva jî nîşana

dide ku ola ezdayê ji berî olên bi pêxember hebûye, dînekî ezmanî ye, ji qewata beşera bilintire... Bi kiryamet û heqya ezmanî Xwedê tek kare bê teref, bê cudayatya olî cihanê, jîyanê, temamya evdan beşeran, ruhberan binhêre, xêr û şera ji hev başqeke, ji alyê tu kesî da li ser kesî zordaryê, neheqyê qebûl neke. Eger êzdîtî bawarî ji pey olên bi pêxember û bi kitêbên pîroz ra pêsda hatibya usane ewê jî li ser navê pêxemberekî bûya û kitêba wêye pîroz jî wê bihata nivîsar.

Sed sala 11an, dema Şîxadî da, qonaxeke nû di nava ezdîtyê da dest pê kir. Hatina Şîxadî li nav Êzdîyan bûyareke mezin bû ne tenê di jîyana civakên vê bawaryê da, lê di qewimandinên Rojhilatê yên wê demê da. Besa hatina Şîxadî zû bela dibe. Ji her dera oldarên mezin, sofî, bawarmend, merivên bi nav û deng xwe wê derê digerin, tên ku kiryametên Şîxadî bî çevê xwe bivînin. Rast gotî fikira hatina gelek ji wan, çawa edeba dînê Êzdya da jî dîhar dibe ne ya qencyê bûye. pirspêjda tê çîma guhdarya derşdorn ews pir li ser wê htinê bûye?

Bi texmîn me sebebê hîmlî ew bûye ku ol êdîyê li ser ry ulibndina evdên kurd û daşgerkirin Kurdistanê astengîke pir mezin bûye. Êzdîtî şikênandin pir dijwer bûye. Zanibûn ku hatina zanyarekî wek Şêxadî, sofî û fîlîsofekî dema xweyî mezin, bi kiryamet , herêmê da bi nav û deng wê ruhekî nû bide wê bawaryê û dijwaryê û dijweryên dijî wan wê bêtir

xurt bibin.

Helbet civata Êzdîyan jî Şîxadî zû qebûl nekirin. Bi saya kiryamet, zanyarî û sirra xwe, ya Tawisî Melek (çawa di nav ulmê êzdîtyê da tê gotin) ewî nava civakê da xwe da qebûlkirin, rûpelekî nû di nav vê bawaryê da vekir...

Êzdîtîs, ku bikaribe ji ber êrîşên derşdoran xwe biparêze (we demê ew êrîş ji derva pir bi hêz, dijwertir û xeter bûbûn) hewcê rêformên xweparastinê bû Şîxdî di nav vê civakê da hîmê sedhedeke nû danî. Û anegorî wê sed û hedê jî bi texmîna me hinek tişt hatine guhestin, felsefa sirrê û xweparastinê nava Ezdayê da xurt bû, dewsa navên pîroz yên berê (xêncî Tawisî Melek) navên din hatine nav vê bawaryê, bingeha xwedênasyê, bîr û bawaryan mane mîna berê. Li lalişa Nûranî medreseke dîndaryê ya xur ava kir. Navê xweyî mezin nava êzdîtyê da nivîsî, bû rêberê wêyî heta hetê. Bandora Şîxadî li ser civaka Êzdî ewqas mezin bû, ku ki pey wî ra jî ulmê bawarya êzdîtyê çawa ulmê Şîxadî hate navkirin. Heta qewl, beyt, kitêbên Êzdîyan yên pîroz û rêform guhertinan ku payê dema Şêx Hesen, lawê Şîxadyê duda da pêk hatin tev bi navê Şîxadî va tên girêdan.

Êzdîtya berî Şîxadî, bi rastî jî hîmlî di bin perda navê wî da ma. Çi bi ci va hate guhertin di nava terîyê da maye, berovajî her tiştê ji pey ra çêbûyî rind hatine xweyîkirin û gihîştye me. Gelo eva yeka qestî, bi merem ne hatye kirin? Nêtek di vê sirrê da tune? Yan dijweryên van sedsalên de-

wyê, yên zezev  tiştên kevn tev ji bîra xelqê şûştune, birine... Eve pirseke pir girînge, ku niha pêşya lêkolînvan û zanyarên êzdîtyêsekinye.

Dînê êzdityê ulmê ronayê û şewqê ye. Êzdî rojê dihebînin. Sibê şebeqê serê xwe li ber xwedanê xwe datînin. Dema mirya dikine çel bere wî berbi rojhilatê dikin. Sonda evdên Êzdî  Şems û ŞêŞimse. Ji berî rojyê ÊZÎ û Xudana rojyê şêşims digerin.

Êzdîtyê da nijarperestî tune: Êzdî dema duea dikin, dibêjin: Xwedê tu pêşyê bidî 72 miletî paşê bidî me. Hinek qewl, beyt, çîrok û tiştên ulmê êzdîtyê yên din dîyarî şexsyetên dîrokî, heta yên ne Êzdî jî hatine kirin, kîjan bi kirên xwe alyê rastyê, re mê û heqyê bûne û di demên dîrokî, yên giran da bi çevê rastyê û remê êzdîyan nihêrîne, destê alîkaryê dirêjî wan kirine.

**(Qewlê Helec, Yêzîdê lawê muawî, SUltanê Şamê).**

Rola ûlmê bawarya Êzdîyan mezine di jîyankirina, pêşxistin û dewlemendkirina zimanê Kurdî da. Dema zimanên olên desthiletdar, zimanên gelek wek Kurdan di bin xwe da dipelçiqandin, çel dikirin, bi şûrê tunekirinê dibirîn, Êzdîyan bi xûna xwe ev ulmê bi Kurdî xweyî kirin eydşe refat, şîn û şayî, dueayê xwe tek bi zimanê xweyî şîrin dikirin. Pêşya bi Kurdîke xweş, kurmancîke delale dewlemend, bi zimanekî maqûl ev ulma ji mera hîştine. Di werê zimanzanî da bi dereca akadêmî lêkolînkirina vê edebê wê ne ku tenê

ferhenga zimanê ªurdî zengînke, lê ronayîkê bavêje li ser hinek pirsên giramatîk û zimanzanya Kurdî.

Çawa me jorê jî got ev ulmê kurdwarî û Kurdistanî, gelekî kûr, pirseecem û pirqete. Mebesa min nine di vê gotara kurt da li ser pirseke êzdîtyê bisekinim, analîzkim, girêfûtûtka vekim, serxet û binxeta qewl, beyt û berhemên din şirovekim, xwestina min ewe ku rastya vê bawaryê ji xwe û xwendevana ra eşkerekim. Usa jî dûrî daxeza mine vê gotarê da ulm û Xwedênasya olan himberî hev bikim, ji bo pey her olekê bi mîlyonan bawarmend sekinîne, bawarîya her kesî ra hurmeta min heye û wek Êzdî dibêjin: **Dînê her evdekî bira jê pîroz be.**

Tu bawarî dijî hev nînin. Hukumdar ji bo kara xwe olekê çawa çek dijî evdên ola din didin kêranîn. Navbera olan, milet û netewada neyartyê çê dikin.

Lêkolîna ulmê ayîna dînê Êzdîtyê ez anîme wê fikirê ku ev ola evdên sadeye. Her xwestinên wê olê sev hemyn xeyî, ell û sdene. Li vê olê d ≈wedê, melek û milyket, horî û yên me çêtir (enc yn zirav) beşer yan rohê wn nînin evd, îsn, ruhber tev bl wn yekin. Teva bi çevekî dinhêrin, bêyî cudetya bawaryê, miletyê, ziman, reng, zengînbûnê... Wê bawaryê da tune ku evd tev gotî bêne li ser bawarya wî.. Evd tev jî evdê Xwedêne, ruhberin.. Ya sereke ewe ku xwedênasbin. Bawarya xwe bi Xwedê bînin. Raste, ji pey hatina Şîxadî ra hinek guhertin ketine êzdîtyê. lê dîsa di

bawarya evdên Êzdî da ew xwedênasye heq û zelale ya suriştîye berê ma.. Bi texmîna me qewata êzdîtyê hema xezayî û zelalya xwe da ne. Ji bo wê jî bi hezaran salan hukumdarên bawaryê din çi bêjî dikin, nikarin kola êzdîtyê ji dilê xelkê bi qetînin, derxin..

Pirs pêjda tê eger êzdîtî dînekî ewqasî qence, bawarya Xwedênasyl, heqî, rastî û remê ye, çima bi dewrana ji alyê hikumdarên bawarî û bawarmendên olên din va (nav da Kurdên muslman jî) ev civak nv kirine bêxweda, kafir, dêwparast, heram; nan, xwerin, destkuja wan nexwerine, heta silav daîna wan jî heram kirine, pêra jî qetikirin û talankirina malê wan ji xwe helal kirine, jinên wan xwe ra birine,wan bazarên rojhilatê da çawa kole firotine. Ev fikira salaye bi hukim, bûye sebebê qetlemên mezin, fermanên birakuhê...

Min, wek nivîskarekî Kurd bi lêkolînkirina ulmê vî dînî xwest sura vê pirsgirêkê him ji bo xwe, him jî xwendevanê xwe ra zelalkim.

Ez ne oldarim, ne olperestim, ne jî nijarperestim. Ez nivîskarekî Kurdim ku di dewrana komûnîstyê welatê Sovyêtê da mezin bûme. Ji min ra bawarî û sonda here mezin AZADÎ ya evde, ji hev femkirin, ji hev bawarkirin, biratî ûpismamtîya gelên cihanê û ji xwezeva dagerkiran rizgarya welatê min KURDIsanê .

rşmbên da sovyêtê bi rastî ne atêîstên sert bûn, ne jî olperestên kore fanatîk, bi gorî felsefa Dîalêktika Ma-

têrîalîstyê cihanê, jîyanê û bûyaran dinhêrîn. Di gorî wê felsefa zanyaryê matêrya, jîyan time di nav hejê pêşdaçûyînê da didîtîn.

Rast gotî gelek dogmên dîndaryê ji min ra xerobin û dûrî zanyarya îroyî ne. Ez bi hurmet nêzîkî wan dibim lê ji min ra rastya wan wek rasta çkên gelêrî ye. Li welatê Sovyêtê nava civaka da pirsên şexsa yên olî gelek kêm yan jî pir bi serra dihatne holê.. Seva dîn, bawaryê zordarî yan biçûkdîtina nefsî li ser tu kesî tunebû. Ne jî zemetyên kalşbavan, ku dest bîrşbawaryên hukumdarên dewra xwe kişandibûn diketin bîra me... Me tirê ew dijwerî dewranên çûyî ra êdî çûne û paşda nayên. Raste extyarê me di wî werî da hinek tişt digotin û ji hinek peyvan disilikîn, carna ji me gazin jî bûn lênivşê me ew bîranîn çawa tîşten derbazbûyî, sebebên bêtifaqyê û paşmayînên fêodalîyê didîtin û bêxem nêzîkî wan dibûn.

Ji pey hilweşîna Sovyêtê ra, hidûdên pola yên dora me vebûn û carekê va waneyên rastya jîyan civak û miletan li ber me vebûn. Sîyasya hukumdara ya olî hê nava mejûyê evd da pir xurt.

Heta niha jî ol destê hukumdaran da çawa çeka here xeter tê xebatê. Bi xûna evdên bawarnede dilsax hukumdar digihîjin text û tacên zêr, bilindayan. Fanatîkên dilsax xwe dikin qurbana xwestekên hukumdarên nêt nepaqij. Min dît ku dîndarya kor li nav gelê Kurd da hê jî xurte.. Ji navê olê ji

alyê hineka da navê welat, tifaq û azadya Kurdistanê jî tê qurbankirin. Payê oldarên dîn û meşebên Kurdistanî yên pirê ji bo azadyî û pêketina Kurdan, tifaq û yekîtya wan nebûne qewatên hevgirtinê. Hukumdarên welatê Kurdan ra jî ew yek pêwîste. Dagerkir piştgorya wê sîyasya xirav dikin û dixwazin nakokyên nav ola da xurtbin. Ji wê yekê teva pitir zîyan digîhîje Kurdên Êzdî. Kurdên Êzdî ne tenê zulma dagerkiran lê usa jî zordarya olperestên Kurd gazinin.

Heta roja îro jî Tirkya di nasnema hemwelatîyê xwe yên Êzdî da, li ber cîyê olê dinivîsin dînsiz.

Li ˙raqê, dema Selam da bi dewletî Êzdî, çaeeb dihatin dîtin. Usa hatye standin, ku Êzdî ji dest cudtê û zodaya olî weên kalbaên xwe heta niha jî dihêlin û direvne Ewropayê.. Kurdistana Bakûr da bawarkî Êzdî ne mane, Başûr Rojava da werên Êzdîyan sêrek dibin, ji Başûr jî rev heye. Raste van salê dewyê berbirbûne gelê Kurd berbi Kurdên êzdî hevkî nerm bûye, lê fikirên bi dewrana ketine serê xelkê guhestin pir dijware. Navê Êzdîtyê li nav Kurdên Musulman da ewqas hatye bêrûmetkiri, ku niha gelek rewşenbîr, ku dixwezin Êzdya jî ji bîr bînin, hela nikarin peyva ÊZDÎ bêjin: birayê meye Zerdeştî...

Vê pirsê da sûcê evdên sade nîne. Gune yê wane yên ku rastya meselê zanin, lê xelkê ra nabêjin.

Peyvek heye ku Êzdî pir jêa cizin û dema ji devê evdekî olên din dibihîn pir diqehirin, Êzdî nav nedin û jêra dibêjin:

peyva ziravşxebera zirav (Ez wê peyvê nanivîsim ku Êzdî nexeydin).

Birastgotî evdên Êzdî, gelek mena wê peyvê jî nizanin, lê dema wê xeberê dibîhîn pir dixeyîdin, diqehirin. Derşdor jî, hîmlî Kurdên musulman,eger dixwezin êzdîyan bêşînin, biçkkin,kenê xwe wan bikin, carna jî giva, bi laqirdwêpeyvêdibêjin.Hetahinehevalênminjî bin pozê xwe da kenya ne û meniya wê gotinê ji min pirsîne.

Wê peyvê bişaşî melekê Êzdîyan yê herî pîroz navê Tawisî Melek (serokê meleka) va girê didin. Di nav ulmên olên din da mena peyva xirav dêwe, yan melekê xiravyê, neqenciyê û êzdiyan jî hezav dikin civakeke usa ku melekê xiravyê dihebînin, bêxwedêne, dêwperest in.

Nasbûna min ulml dînê Êzdîyatyê ra ez anîme wê bawaryê, ku dînê Êzdîyan bawarîke Xwedênazyêye pir jevnare, ya heqyl, re mê axret û îmanêye.Mintufikireke xirav,tu xwestineke dijî kesî, bûkirina tu bawaryê,beşerê,nevs êkuştin û qeltikirna kesî ulmê vî dînî da nedît.

Ev peyvên, ku têne gotin di nav tu cimleke ulmê bawarya Êzdya da tune. Êzdîtî nikare hebandina Melekê xiravyê, dêwperestî be. Ji bo hîmê wê bawaryê da hebandina here jorîn ÊZDA ye, Xwedê ye... Xwedê li bawarya Êzdîyan da yeke, bê jeval û bê şirîke. Qencî jî xiravî jî ji Xwedê tên... Ew herd xweyset dijî hevin lê bi hevra ne. Çawa di nava suru ştê da mirin û jîyan, ronayî û terî, ken û girî, meq-

qledûzê da serê pilyûz û serê mînûs dijî hevin lê bi hevra ne, bêyî yekî ya din nikare hebe... Ûsane Êzdî bawarya xwe bi qewatên wuru ştê tînin. Kîjana da qencî jî heye, xiravî jî.. Bêyî yekbûn, hevgirtin, hevkarya herdu alyan jîyan nikare berdewanbe, pêşda here, nû bibe. Usane li nav bawarya Êzdya da Melekê xiravyê, neqencyê nikare hebe. Êzdtyê da dûalîzm tune.

Bi texmîna min ulmê vê bawaryê usa pir dewlemend, makkirî, hevgirî, kûr û dûre, xwedênasî, heqî, wekehevtî li ser asteke usan bilind hatine danîn, ku bi rastyên usan nikarin nava wê da welşê vekin, di çevê bawarmenda da wê bêrûmetki, ji bo wê jî erastî, şer û şiltaxê bê îm xêrnezwazan berê berê da anîne Êzdityê va girê dane... Ku bi wî teherî karibin der dora rakin dijî Êzdiyan, wan bi zora şûr, qirkirinê holê rakin, bi wan nerastyan êzdîtyl çawa ruhê kurdîtyê, ziman û zarê duea diroze, girt û şabûna wê, çawa tiştekî dijî xwedênasyê çavên wvdên Kurd da bêrûmet bikin û dewsê bigrin.

Bûyarên dîrokî nîşan didin, ku ji alyê bawaryên nû da mîna bawaryên din êzdityên din êzditayî zû nehate kênandin, tesmîl nebû. Zû dewsa xwe neda oleke din. Kurdistan ew walatê tenê bû, ku pêvajoya, xaçparêzkirin, paşê jî îslamkirinê da pir ber xwe da, ew prosês pir dijwer, dirêj û bi deweran kişand. Kurdeyatî alt nedibû. zimanê Kurdî zîyê xwe nedida tu zimanî. Dagerkiran  rind zanibûn ku ruhê

kurdewarî di nav êzdîtyê dane. Êzditî tunekirin, tunekirina kurdetyê ye. Û berêûrê neyartyê dane berbi wê civakê. Vê carê şûr xebitî, êrîşpey êrîşan, ferman pey fermanan Kurdistan kavilkirin. Heta îro jî ji bo tunekirina gelê Kurd şûr û zordarî têne xebatê. Lê çi jî dikin ew ruh dilê Kurda da namire.

Ronakbirê Ermenya yê sedsala 19an Xaçatûr Abovyan sala 1845an diçe nava Kurdan û du gotarên dîrokî derheqa wan da dinivîse: navê yekê KURDe ya din ÊZDÎ. Sala 1848a li bajarê Tilvîsê pojnema KAVKAZ da berê gotara Kurd, çend meh şûnda jî ya ÊZDÎ bi zimanê rûzî tên weşandin. Gotara ÊZDÎ da ew tê ser vê fikirê Ev hemû me tînin li ser wê fikirê, wekî ev cimet (Êzdî, E.B) dêwperest hatye navkirin tek rûyê wê yekê da, ku cimetên cînar li wana kirine eynat.. Ew cimetên cînar bi fanatîzma xwe eyanin, kemala qanûnê wane (Êzdîyan. E.B)

dînî fem nakin, loma jî nikarin bigihîjne wê felsefa moralyê... (7)

Eger em... bi heqî û dûrbînî bifikirin, wî çaxî emê ecêvmayî bibînin, ku ew çawane, wekî cimeteke waye nexwendî ya koçar (Êzdî. E.B) karibûye bigihîje femdarya vî teherîye kûre zanyarî. (8)

Dagerkirên civak û olî, ku bêtifaqyê bikin li nav gelê Kurd, welatê wan bin hukumê xwe da xweyîkin, ziman, çand û rohê miletyê di nav wan da dibin kuştin, çeka

dîndijminatyê ya xetar çqas kêfa wan hatye bi destê fanatîk, cahil û xweyînên xwezatyê dijî kurdên Êzdî dane kêranîn.

Bi wan şer şiltaxan mejûyê hinek kurdan bi afyona olê jerdadayî kirine alyê din jî xelqê bê sûçşguneh qir kirine malşhal keda wan talan kirine şewitandine, zimanê wan birîne, welatê wan kirine gola xûnê, cîyê zulm û zorê. Û bi wî cûreyî him Kurdistan, him jî bawarya ewdên Kurd hêdî hêdî dager kirine.

Lê Êzdî çima heta  niha jî nikarin rastya xwe biparêzin? Çima ji xebera zirav disilkin, dixeyîdin? Çima rastya dînê xwe nîşanî cihanê nadin?

Ya ewlin wew kesî guh nadye dengê Êzdîyan. Heta vê sedsala dewî jî, kê ji Êzdîyan dengê xwe kirye bi devê şûr jê ra axivîne. Pelên dîrokê nîşan didin, ku kêmin ew mîrên Êzdîyan, Extyarên Mergê û oldarên mezin ku bi mirina xwe ya xezayî wefet bûbin. Êzdî jî mecbûr mane rastya xwe kesî ra nebêjin, xwe ker bikin.

Ya dudan çawa dîrokzanê Kurd Şekir Fetah* dibêje: Ev navê (navê dêw, xebera xirav) li dewyê xistine ser Êzdiyan da ku wana pê bi şkênin şçunku bawarya wan ji ya Îslamê cihêye şmîna ku mele Yehyaê Mizûrî we kiriye, dema ku xweast tola xwe li malbata mîrê Êzdîyan veke, wilo xelk tê gehandin ku Êzdî zendîq û kafirin, lewma bi navê ola Îslamê fermana wan rakir.(9)

Ya sisyan qewata Êzdyan, ne ya zanyarî, ne jî ya  fizikî

têrê nekirye ku bikaribin dijî qewat û fikirên dagerkir û desthilatsaran derên. Dewletên qewat, xweyê lêşkerên giran, hînê aborîyî mezin, û sîyasya de şilatdar, bêhesav zanyarên bawarmend, mejûyên bi aqil, Bi hezara dêr û mizgevtên di nav zêr û cewahera da pêçayî, bi mîlyonan fanatîkên nezan.. Êzdî ji civakeke nexwendî, feqîr, zêrandî, pelçiqandî, bê maf û bê pişt, Lalişeke wêrankirye, belengaz... Di vî halî da wê çawa dengê Êzdiyan bihata bihîstin...

Niha sifet û rastya wê sîyasîyê rind tê xanê. Meremê hîmlî tenê tunekirina êzdîtyê nî bûye (şer ne seva dîn û bawaryê bûye). Merem asîmlekirin, tunekirina gelê Kurd, Kurdistanê bûye. Eger ew şer dijî êzdîtyê bûye, dema sedî nodê Kurdan musulman in, çima dîsa sewletên ola wan musulmanî ye Kurda nayên remê. çima tu lîdêrekî weleten îslamê, tu hukumatek, dewletek, navdaoldarên îslamê, zanyar û bawarmendên wan ne ku piştgirya Kurdan nakin lê neyartyê kurda ra dikin, xwestina wan ji holê rakirina gelê Kurde. Çi ye sebeb? Ne Kurd jî muselman in?.. Kurd tek seva mafê xwe yê îsanî şer dikin. Wanra yek nîne Musulman çi milete, bi çi zimanî diaxive? Çima naxwazin dewletek musulmanî ya Kurda jî çê bive?

Min ji devê gelek meznên Kurdên êzdî bihîstye, dibêjin: Desthilatdarên Îraq, Tirkyayê Sûryayê jî niha me (Êzdyan) ra dibêjin, hûn Êzdî miletekî belengazîn, hûn Kurd nînin, karê we bi Kurdan neketye, hûn nekevne nav vê dozê, dewa

me bi wera nîne, Kurda ra ne...

Sedsalek dudu berê dew bi êzdîtyê ra bû, niha jî dema taqet êdî êzdptyê da nemaye û ruhê Kurdîtyê di nav Kurda da hişyar û bi hêz bûye êdî berê xwe dane ne olê, lê Kurdîtyê...

Dijwar nîn tînin... Gelê Kurd qurbanekî sextekarya hukumdarên ROJHILATÊ ya bi dewranane... e êdî bê dîti, ku heta roja îroyîn jî cihanê da gelek hêz û girûp, usa jî deletên xwe XWEDÊNAS divînin, di bin perda xwedênasî heqîya dîndaryê ya sexte da qetil û qanên nemerivayê ye zulm dikin, bi wan Bawarî û alan bi xûna wvdên dilsaxe bawarmend meremên xwe yên dagerkirinê, talankirinê, hêzîrkirin û qûlkirina miletan, pêk.